

Nûçe û Çalakî

Nûçe û Çalakî

Çilrojîya Nemir Dr. Şêzad Hac Reşîd

Di bîranîna hevalê nemir Şêzad û çelrojîya wî de ,li ser vexwendina rêxistina Helebê ya Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ,bêtirî dused ciwanên Kurd ji keç û lawan li deriyê bajaroka Reco li hev civîn, kat 9 ê sibê û bi cilên sipî yên bi wêneya pakrewan Şêzad xemilandî , karwana meşê bi sirûda netewî ya Kurd (Ey Reqîb) dest pê kir.Bi hildana alên rengîn,ala Kurdistanê û yên partiya D.r Şêzad ,bi hestekî bilind û bankirina siloganên wek: bijî yekîtiya gelê Kurd, Namire heval şêzad namire, kî ne em...Kurd in em, û kî ne em...yekîti ne em jî, bi rê ve çû. Li ser deng û banga kerwana hevalê Şêzad, bi sedan kes ji miletê Reco hatin pêşwaziyê, li her aliyên kolanan rawestî, rêzgirtin ji wê meşê û pakrewan re girtin

Û xortên payebilind,
meşa xwe di nav
gelî û çiyayên bi şana
aştiyê (darên
zeytûnan),xemlandî
berdewam kirin.Ew
dar û berên sêwî -yên



ku her dem li benda D.r Şêzad bûn û bi dîtina wî şîn û geş dibûn- vê carê bi çemelên xwar û pelên çelmisî ,karwana Şêzad pêşwaz kirin.Meşa ciwanan li gel karwana otombêlan, bi awakî şaristanî û heyamek xemginî berdewam kir,ta li kat 1 ê nîvro gihan gundê Elemdara,gundê heval şêzad. Li pêşiya gund ,bi hezaran kes ji gundî û mêvanan , pêşwaziya karwanê derketin. □ piştî ku dost û hevalên şehîd ,bi ditina gorna wî re,çavên xwe bi hêstiran kildan ,rêwiresma çelrojîya hevalê nemir D.r Şêzad dest pê kir:

1)pêşwazî û sipasiya millet bi navê Partiya yekîti (pêşkêşvanê rêwiresmê) .

2)Rawestina kêlîlkek bêdeng ji bo giyanên pakrewanên azadiyê û şoreşa Sûriyê û pakrewanên Kurd û Kurdistanê ,bi taybet ji bo giyanê heval Şêzad.

3) Ey Reqîb.

4)Gotina Rêxistina Xwendekaran a Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li sûriyê.

5)Gotina dostên D.r Şêzad.

6)Gotina Encûmana Niştimanî ya Kurd - D.r Ebdil mecît Şêxo.

7)Gotina Encûmana gel a Rojavayê Kurdistanê- Bavê Dilo.

8) Gotina Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê- sekretêrê Partiyê Mihyedîn Şêx alî.

9)Gotina malbata Şehîd Şêzad-Apê Şehîd.

10)Gotina bavê Şêzad endezyar Selah Elemdarî.

.11)Li dawiyê kulîlkek ji kulîlkên çiyayê Kurmênc hestên xwe pêşkêş kir, bi gotina :Encûmana Niştimanî ya Kurd nûnera min e.û pişt re bi Sirûda Ey Reqîb wê kulîlkê gotina xwe bi dawî kir.

Li dawiyê pêşkêşvan bi navê Partiya Yekîti,sipasiya millet kir ,û bi mûzîka xemgîn xatir ji malbata Şêzad hate xwestin.

PÎROZ BE

1-Bi hatina cejna Çarşerma Sor, cejna birayên me yên Êzdî, bi navê komîta birêvebir ya Newrozê, em li xwe û wan pîroz dikin.

2- Bi navê komîta birêvebir a Newrozê,em damezrandina komela Rewşen Berdir-xan li bajarê Efrînê, li xwe û wan pîroz dikin û hêviya serkeftinê jê re dikin.